ŞERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com | Hejmar: 09 | Dîrok: Pûşber 2023 | DENGA ŞOREŞ Û AZADIYÊ

BERXWEDANA GELAN WÊ LOZANÊN NÛ PARÇE BIKE

Bi hevpeymana ku di sala 1923'an de li Lozanê hatiye îmzekirin li dijî gelê Kurdistanê siyaseteke perçiqandin û tunekirinê hat xistin meriyetê. Axên me yên ku bi hevpeymana Kasri-Şîrîn ya sala 1639'an hat du parçekirin bi hevpeymana Lozanê vê carê hat çar parçekirin. Bi siyaseta mêtîngerî, şerê taybet û asîmîlasyonê xwestin ku me bikin Tirk, Ereb û Farsî. Bi sînorên ku bi esasgirtina berjewendiyên emperyalî bi cedwelan hatin xêzkirin tenê ne gelê Kurd, tevahî mezhep, ziman, ol, çand û netew hatin perçiqandin.

Di nav vê sedsalê de Rojhilata Navîn destpêkê de li erdnigariya Kurdistanê û gelek dewerên din bû şahîdê berxwedanên dîrokî. Di nav vê sedsalê de dewletên emperyalî bi tifaq çêkirina dewletên paşverû re xwestin van berxwedanan biperçiqînin. Lê bi ser neketin. Sala 2023'an sala ku dema vê hevpeymanê diqede ye. Em li dijî van hevpeymanên mêtînger li Rojava weke gelên Bakur û Rojhilatê Sûrî bi rêya Rêveberiya Xweser vîna xwe xurt dikin û xwe diparêzin. Gelên herêmê wê Lozanên nû qebûl neke. Wê bi berxwedanên xwe her tim li dijî emperyaliyetê bi esasgirtina berjewendiyên gelê herêmê li kolanan bibin. Li dijî Lozanên Nû tevahî gelên bindest bibin yek.

2 ROJEV: Hilbijartinên Tirkiyê, Civîna Moskow û Vegera Yekîtiya Ereban

4 JIN: Li Rojhilata Navîn Tundiya Li Dijî Jinê

3 DÎROK: Hevpeymana Lozanê; Erêkirina Parçebûna Kurdistanê Ye

5 BÎRDOZÎ: Dengê Şehîdên Me Yên Ku Ji Her Derê Tê

Hilbijartinên Tirkiyê, Civîna Moskow û Vegera Sûrî ya Yekîtiya Ereban

Teva dengdana 28'ê Gulanê li Tirkiyê pêvajoya hilbijartinên parlamento û serokomariyê temam bû. Di tûra yekemîn de di hilbijartinên parlementeriyê de tifaqa AKP-MHP – Hîzbûlkontra piranî bi dest xist. Tifaqa Milet negîhaşt hedefa xwe. Tifaqa azadî û kedê ya ku bi Partiya Kesk a Çep tevlî hilbijartinan bû jî negîhaşt hedefa xwe. Di tûra yekemîn de ji bo ku Erdagan û Kiliçdaroglu negîhaştin ji %50 hilbijartin hatin dubarakirin. Di encamê de tifaqa faşîst hem serokomarî hem jî piraniya meclîsê bi dest xist. Bi vî awayî komara Tirkiyê weke hejmarî bû parlamentoya herî faşîst û paşverû ya dîrokê.

Erdogan û tifaqa wî ya faşîst, berî hilbijartinê tevahiya siyaseta xwe di xeta dijminatiya Kurd de meşand. Têkoşîna gelê Kurd a azadiya neteweyî ya li Bakurê Kurdistanê ji bo dewleta Tirk kir pirsgirêkeke hebûn û tunebûnê. Gelê Tirk li ser rastiya tirsê xist bin zextê. Gelê Rojava yê ku bi bedêla hezaran şehîdan azadiya xwe bi dest xist ji xwe re kir hedef. Erdoganê faşîst bi xurtkirina nîjadperestî û şovenîzmê di hilbijartinan de bi ser ket. Di axaftina xwe ya roja yekemîn de da xuyakirin ku ji bo tunekirina destkeftinên gelê Kurd wê siyaseta xwe ya êrîşkar berdewam bike.

Êrîşên dewleta Tirk a dagirker, tenê bi têkoşîna parlamenteran a di parlamentoyê de nayê sekinandin. Berevajî ew jî hedefên mêtîngeriyê ne. Li çar parçeyê Kurdistanê gef li mafa hebûnî, çand, nasname û zimanê Kurdî tên xwerin. Em ê di heyama pêş xwe de bi êrîşên dagirkeriyê ve rû bi rû bimînin. Êrîşên dewleta Tirk a dagirker çiqasî berfireh dibin bila bibin divê em bi heman şêweyê bersiv bidin. Divê berxwedana me belavî çar parçeyê Kurdistanê bibe û em her cure şêweyên têkoşînê bixin dewreyê. Li dijî dewleta Tirk a faşîst ku dixwaze gelê Kurt tune bike bersiva herî xurt têkoşîna çekdarî ye. Ji ber vê sedemê divê em li bajar û çiyayan têkoşîna xwe ya çekdarî hîna mezintir bikin.

Ligel ku di hilbijartinan de bi ser ket Erdoganê faşîst û dewleta Tirk a mêtînger ji ya duh hîna qels e. Aboriya wî hilweşiyaye, rewşa siyasî ya hundirîn tevlîhev e, piştgiriya navneteweyî qels bûye, bi dizî, derew û xapandinê hatiye rewşa dewleteke riziyayî. Li Rojhilata Navîn siyaseta peresîna Deryaya Spî Efrîqaya Bakur têk çûye. Wekî berî sed sal derfeta meşandina siyaseta Osmanî êdî tune ye. Berî hilbijartinan ji bo ku bi Misir, Îsraîl, Erebîstana Seûdî têkîliyan ava bike tawîzên mezin dan. Ji bo ku bi rejîma Esed re li hev bike Pûtîn xist dewreyê. Hewl da ku li ser Esed zext ava bike. Dewletên din bi Erdogan re ji nû ve têkîlî avakirin. Hikûmeta Şamê hevdîtin qebûl kir lê îlan kir ku bêyî derketina leşgerên Tirk ji axên Tirkiyê wê tu têkîlî nayên avakirin.

Encama Civînên Moskow

Li ser xwesteka Erdogan û bi zora Pûtîn wezîrên karên derve ya çar dewletan (Tirkiyê, Rûsya, Sûrî û Îran) û serokên istixbaratan li Moskowê civiyan. Dewleta Tirk xwest ku Sûrî qanah bike. Weke gava yekemîn vekirina rêya emfor, paşve vekişandina beşek ji çeteyan û vekirina deriyên gumrikê pêşniyar kir. Derheqê herêmên ku dagirkirî de tiştek negot. Berevajî bi hev re şerkirina li dijî Rêveberiya Xweser û teswîyekirina şoreşa Rojava pêşniyar kir. Nayê zanîn ku rejîma Sûrî derheqê vê pêşniyarê de çi gotiye, lê hat îlankirin ku bêyî dawîbûna dagirkeriyê wê tu hevdîtinên Erdogan-Esed çênebin. Dewleta Tirk di her alî de qels bûye û ji ber vê yekê ji bo ku êrîşeke nû bîne ser Rojava ew hewceyî piştgiriya Sûrî ye. Tenê ne di milê leşgerî de, wê di milê siyasî û dîplomatîk de jî bi lihevkirina bi Sûrî re amadekariya êrîşa Rojava bike. Di vî milî de sekna rejîma Sûrî girîng e. Tê dîtin ku ji civînên Moskowê tiştek derneket. Lê dîsa divê nayê fikirîn ku ev civîn tenê ji bo xurtkirina Erdogan tên lidarxistin. Hedefên stratejîk ên dewleta Tirk hene. Ew dixwaze ku dagirkeriyê mayinde bike. Civînên Moskowê rêyeke xeter vekir û bi dewleta Sûrî re dest bi hevdîtinan kirin. Erdogan wê di vê rêyê de gavên xwe berdewam bike. Dema ku di aliyekî de dagirkeriya dewleta Tirk berdewam dike di aliyê din de lihevkirina wê ya bi rejîma Sûrî re zehmet e. Ji bo ku vê pirsgêrêkê çaresar bike siyaseta xwe ya Sûrî li ser Pûtîn dide meşandin. Wê bi vê rêyê zextên xwe yên li ser rejîma Esed zêde bike. Wê bi êrîşên Îsraîl û zora Pûtîn hewldana razîkirina Şamê bide. Encax pêşketinên nû yên di siyaseta herêmê de destê dewleta Sûrî xurt dike.

Vegera Sûrî ya Yekîtiya Ereban karê dewleta Tirk dijwartir kir. Berî 12 sal piştî destpêkirina şerê navxweyî Sûrî ji Yekîtiya Ereban hatibû derxistin û di qada navnetewî de bi wateya kamil hatibû tecrîdkirin. Îro ji nû ve vegera Yekîtiya Ereban a Sûrî nayê wateya ku qeyrana Sûrî çaresar bûye. Di vî milî de di aliyê rejîmê de tiştekî ku hatiye guhertin tune ye. Di aliyê dewletên Ereb de têkîliyên berjewendiyan guherîn. Urdûn, Erabîstana Seûdî û Mirnîşînên Yekbûyî yên Ereb ji ber vê sedemê mecbûr man ku siyaseta xwe biguherin. Nêzikbûna ku di navbera Îran û Erebîstana Seûdî de destpêkiriye dikare di milê şerê Yemenê de deriyê çaresariyê veke. Di aliyê din de siyaseta ku bi sedema qutkirina têkîliya navbera Îran û Sûrî hat meşandin encam neda. Berevajî têkîliya dewleta Îran û Sûrî hîna xurtir bû. Geşedanên weke nakokiyên hundirîn ên li Tûnûsê, li Iraqê lêgerîna aramiyê, reqabeta navbera Misir û Erebîstana Seûdî, di dewletên Ereb, Sîn û Rûsyayê de xurtbûna têkîliyan, di seranserî Rojhilata Navîn de kêmbûna bandora Emerîka û hwd. zor lê kir ku dewletên Ereb siyaseta xwe biguherin. Di pêvajoya nû de rejîma Sûrî bi piştgiriya aborî, dîplomatîk û siyasî ya ku ji dewletên ku endamên Yekîtiya Ereb bigirin wê li dijî Tirkiyê hîna xurtir bibe. Ligel van hewldanên dîplomatîk ên Rêveberiya Xweser û lêgerîna wê ya derheqê çaresariya qeyrana Sûrî bal dikişîne. Rastî ew e ku şoreşa Rojava ne sedema qeyrana Sûrî ye, Şoreşa Rojava yek ji encama şoreşger a qeyranê ye.

Civîna Moskowê, Vegera Sûrî ya Yekîtiya Ereban, Hilbijartinên li Tirkiyê û ji nû ve weke serokomar hatin hilbijartina Erdogan wê di siyaseta Rojava – Sûrî û Rojhilata Navîn de guhertinên girîng derxe holê. Di heyama nû ya ku emperyalîst û dewletên herêmê pevçûna xwe ya berjewendiyan didin meşandin de di milê pêşeroja gelên Rojava – Bakur û Rojhilatê Sûrî xeterî û derfet di nav hev de ne.

Di ev heyama ku salvegera 11'emîn a şoreşa Rojava nêzik dibe de têkoşîna gelan a avakirina pêşerojeke hevbeş a di bingeha edalet û azadiyê de berdewam dike. Di bin gefên êrîş û dagirkeriyê, embargoya aborî, tecrîda dîplomatîk û dorpêça siyasî de pêşveçûna xwe berdewam dike. Dîroka me ya 11 salan a şoreşê nîşan da ku, komkujî û zilma dewletên faşîst û paşverû, tade û zorbaziya wan dibe sedema qeyranan û yekîtiya dildar a gelan, dorhêla demokratîk a ku spartiya edalet û wekheviyê qeyranan çaresar dike. Di vî milî de pergala Rêveberiya Xweser a Rojava ji bo herêmên din ên Sûrî û tevahî Rojhilata Navîn weke pergaleke mînak û modêl xwedî girîngî ye. Yek ji erkên herî girîng a li pêş şoreşa me ye û di heman demê de misogeriya me ye mezinkirina têkoşîna demokratîkkirina Sûrî ye.

Hevpeymana Lozanê; Erêkirina Parçebûna Kurdistanê Ye

Dîroka Kurdistanê, bi êrîş û komkujiyên dewletên mêtînger ên herêmî yên dagirker û emperyalîst ên li dijî netewa Kurd dagirtiye. Welatê me kirin çar parçe û mêtîngeh kirin. Hebûna me ya neteweyî, dîrok, ziman, çand û gerdîşên me tune hesibandin. Dîroka me di heman demê de li dijî feraseta mêtînger dîroka serhildan û têkoşînan e.

Bi hevpeymana Kasr-i Şîrîn; Kurdistan Bû Du Parçe

Kurdan, bitûniya axên Kurdistanê bi sedema hevpeymanên Kasr-Şîrîn û Lozanê windakirin. Encax, di van her du hevpeymanan de jî Kurd ne teref bûn. Hêzên serdest, Kurd tune hesibandin û ev peyman di navbera xwe de îmzekirin.

Di encama feraseta mêtînger a dewletên Osmanî û Safevî ya ku berfirehkirina axan de di dîroka 17'ê Gulana 1639'an de li eyaleta Kîrmanşahê hevpeymana Kasr-i Şîrîn hat îmzekirin û piştî vê di encama şerê navbera du împaratoriyan de Bexda ket destê Osmanî. Sînorên navbera du dewletên ku hebûna Kurdan tune dihesibandin ji nû ve hatin xêzkirin û bi vî awayî Kurdistan bû du parçe.

Ev rewşa du parçebûna Kurdistanê heta yekemîn ribek salên 1900'an berdewam kir. Împaratoriya Osmanî, di şerê 1'emîn şerê emperyalîst ê parvekirinê de têk çû. Beşeke mezin ji axên wê ji aliyê dewletên emperyalîst ve hatibû desteserkirin.

Êdî împaratoriya Osmaniyan ber bi parçebûnê ve diçû. Weke terefa ku têk çû hevpeymana Sewrê îmze kir. Di hevpeymana ku di 10'ê Tebaxa 1920'an de di navbera dewletên îtilaf û Osmanî de hat danîn de, axên Kurdistanê weke "Herêma Kurdan" hat pênasekirin. Bi vî awayî li ser mijara statûya Kurdistanê ihtimala guhertinê derket holê.

Di bendên hevpeymanê yên 62 û 64'an de wiha dihat gotin. "Herêma Kurdan; Lijneyeke ku ji nûnerên Îngîlîz û Fransayê pêk tê wê li wîlayeta Kurd a ku li Rojhilatê Feratê ye wê pergaleke rêveberiyê ya herêmî ava bikin; Piştî salekê ger ku Kurd bixwazin wê karibin ji bo serxwebûnê serî li Sazmana Miletan bidin"

Hedefa emperyalîstan, li Kurdistanê avabûna welatekî bendewar mêtîngeh bû. Axên Kurdistanê cûda dihat dîtin, encax mafa serxwebûnê ya Kurdan tune dihat hesibandin. Encax ihtimala vê jî burjuvaziya Tirk xist tirsê. Li dijî bendên Sewrê ketin nav lêgerînên nû. Piştî hilweşîna Osmanî û îlankirina komarê têkîliyên burjuvaziya Tirk bi dewletên Ewropayê re xurt bû. Emperyalîstan li dijî Yekîtiya Sovyetan rola qereqolbûnê da dewleta Tirk. Êdî pêwîstiya piştgirî girtina ji Yekîtiya Sovyetan ji holê rabûbû.

Hevpeymana Lozanê; Kurdistan Bû Çar Parçe

Di Dîroka 24'ê Tîrmeha 1923'an de, hevpeymana Lozanê ya ku qebûlkirina Komara Tirkiye û diyarkirina sînorên wê dabîn dikir hat îmzekirin. Daxwaza dewleta Tirk pêk hat û hevpeymana Sevrê derbasdariya xwe winda kir.

Di konferansa navneteweyî ya ku li Lozanê hat lidarxistin de û hevpeymana ku hatiye îmzekirin de hebûna gelê Kurd hat înkarkirin. Lê di derheqê Kurdan de biryar hatin girtin.

Hevpeymana Lozanê di navbera Tirkiye, Îngîlîstan, Fransa, Îtalya, Japonya, Yewmenîstan, Romanya û Sirp-Xirwat-Siloven de hatiye îmzekirin. Teva vê hevpeymanê hatin damezrandina komara Tirkiye hat qebûlkirin û sînorên nû hatin danîn.

Dewletên emperyalî, li dijî xurtbûna Yekîtiya Sovyetan hîna di destpêka avabûna wê de rol dan komara Tirkiye. Di aliyekî de têkîliya dewleta Tirk bi emperyalîstan ve pêş diket, di aliyê de din axên Kurdistanê yên ku bi hevpeymana Kasr-i Şîrîn hatibû du parçekirin, bi hevpeymana Lozanê jî di navbera Tirkiye, Iraq, Sûrî û Îranê de weke çar parçe hat parvekirin. Mafên netewa Kurd jî di her parçeyekî de ji serdestiya dewletên mêtînger re hat terikandin. Hevpeymana Lozanê, ji bo axên Kurdistanê û Kurdan re peyambera êrîşên qirkeriyê yên nû bûn. Di sala 1925'an de bi sedema serhildana Şêx Saîd qanûna Takrîr-î Sûkun ku rayeyên rewşa awarte dida hikûmetê hat derxistin.

Hevpeymana Lozanê ya ku di ser re 100 sal derbas bûye, tê wateya ji aliyê emperyalîst û dewletên mêtînger ên herêmê ve çopandina azadî û înkarkirina hebûna netewa Kurd.

Bi hevpeymana Lozanê tenê axên Kurdistanê nehat parçekirin. Di heman demê de têkoşîna azadî, jiyana civakî, çand, dîrok û zimanê netewa Kurd jî hat parçekirin. Li her parçeyekî Kurdistanê Kurd girêdayî navendên mêtînger ên ku tê de rastî siyaseta asîmîlasyonê hatin. Dewletên mêtînger ji bo şkenandina vîna Kurdên ku azadî dixwazin û radestgirtina wan li ser axên Kurdistanê bi dehan komkujî çêkirin. Welat bi têla direhî ji hev hat qutkirin û li ser sînorên fermî derî hatin çêkirin.

Dewletên ku qelskirina zanebûna Netewbûnê ji xwe re kirin hedef, xwestin ku bi vê rêyê pêşketina têkoşîna azadiya Kurd asteng bikin. Weke Kurd hebûna me hat înkarkirin, lê di nav van salên dirêj de me têkoşîna xwe bi serhildan û raperînên cûda berdewam kir. Lê weke encameke parçebûnê ev têkoşîn negîhaştin serkeftinê.

Li Dijî Hevpeymanên Mêtînger; Azadî, Yekîtî û Sosyalîzm

Bi kurtasî, hevpeymana Lozanê, tê wateya erêbûna navneteweyî ya jenosîda Kurdan. Di heman demê de bi vê hevpeymanê gelên Ermen, Asurî, Suryan – Keldanî jî rastî heman siyaseta jenosîdê hatin. Hevpeymana Lozanê tenê ne erêkirina qetilkirina Kurdan e, ew di heman demê de erêkirina fermanên li ser gelê Êzîdî, jenosîda Ermen û komkujiya Seyfo ye. Ji bo gelê me yê ku azadî dixwaze tu hikmê Lozanê tune ye. Divê fermanrewatiya hevpeymana Lozanê ya ku 100 salên wê tije bûye bên derbaskirin û Kurdên ku hapsî çar parçeyan hatine kirin ji bo Kurdistaneke sosyalîst, azad û yekbûyî têkoşîna xwe pêş bixe. Şoreşa Rojava di vê rêyê de gava herî girîng ya ku hatiye avêtin e. Divê em destkeftinên xwe biparêzin û ji bo azadî û yekîtiya çar parçeyê Kurdistanê û yekîtiya neteweyî gavên hîna wêrektir bavêjin. Di 100'emîn salvegera Lozanê ne bersiva herî xurt dabînkirina azadî û yekîtiya gelê Kurd û tevahî gelên bindest e.

Li Rojhilata Navîn Tundiya Li Dijî Jinê

Bi Amûrê Dewlet Ol û Malbat Her ku Diçe Kûrtir Dibe

Tundiya li ser jinê her tim yek ji rojeva nîqaşên me ye. Têgîna tundiyê tenê bi şêweyekê ne sînordar e. Derveyî lêdan, tacîz û destdirêjiyê cureyên din ên weke tundiya aborî, psîkolojîk û hwd. li gorî rolên civakî yên jin û mêr weke rewşeke normal tê girtin dest. Lê em li tevahî kokên cureyên tundiyê binêrin tê dîtin kokên wê xwe dispêre derketina holê ya civakên biçîn. Li tevahî cîhanê îro dewlet, siyaset, jiyana civakî, leşgertî û her tişt li gorî vê rastiyê hatiye avakirin. Ji ber wê ziman, ol, çand, dîrok çiqasî cuda dibe bila bibe êş û dîroka jinê wekî hev e. Ji ber ku rastiya kapîtalîzm û dewletan li ser tundî û tune hesibandina jinê hatiye avakirin. Bi taybetî li erdnigariya Rojhilata Navîn a ku em tê de dijîn bi rê û rêbazên weke hev, bi heman çand û ferasetê bindestiya jinê bi hêmanên wekî dewlet, ol, mezheb, bawerî, eşîr û malbatî hîna zêdetir derdikeve holê. Jin her çiqasî ku li dijî vê têkoşîna xwe bilind dike jî mêr ji ber tirsa windakirina desthiladariya xwe tundiya li ser jinê hîna zêdetir dike. Dewletên emperyalî, dewletên herêmê yên paşverû, mêtînger û dagirker dema ku şerên qirêj dimeşînin fatûreya vê ya herî giran ji jin û zarokan re tê birîn. Ji ber ku jin temsîla wekheviyê, zarok temsîla pêşerojê dikin. Ji ber vê feraseta serdestiya mêr dema ku ji bo şer diçin qadekê bi feraset û felsefeya "destpêkê de li jin û zarokan bidin" tev digerin. Mînaka vê ya herî rojaneyî û şênber Şengal, Efrîn, Efxanîstan, Îran û Rojhilatê Kurdistanê, Tirkiye û Bakurê Kurdistanê hwd. ye.

Li Rojhilata Navîn Tundiya dewlet û mêr

Bi taybetî di heyama dawî de li gorî lêkolînan di Rojhilata Navîn de kuştin û tundiya li ser jinê her ku diçe zêde dibe. Kujer an bav e, an bira ye, an hevjîn e, an jî dergistî û hwd e. Lê tundiya li ser jin û qetlîamên jin her çiqasî ku her roj ji bo jiyana jinan dibe xetereyeke mezin tu hesap nayê pirsîn û bi zagon û feraseta dewlet û civakê ev yek her ku diçe rewa dibe. Mînak di sê mehên dawî de, li Şam, Misir, Lûbnan, Cezayîr û li Tirkiyê kuştinên jinê hîna zêdetir bûn e. Li Efxanîstanê bi hatina Talabanê ku xwe li ser bîrdoziya dijminatiya jinê ava dike tevahî mafên jinan ji xwendin heta derketina ji derve, ji mafa çalakiyan heta xebitînê ji holê hatin rakirin. Hîna di meha çûyî de jineke 13 salî ji aliyê çeteyên Talaban ve hat qetilkirin. Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê her çiqasî ku serhildana jin berdewam bike jî niha êrîşa herî mezin a rejîma Melelî ya faşîst li ser jinan e. Ji roja ku serhildana "Jin Jiyan Azadî" destpê kir de heta îro bi sedan jin hatin darvekirin, bi sedan jin ji aliyê hêzên Melelî ve di dibistanan de tên jehrîkirin ku dev ji dibistanan berdin. Li Tirkiyê bi betalkirina "Hevpeymana Stenbolê" rê li ber tundiya li ser jinê hat vekirin û kujerên jinan bi rêya zagonan bê ceza tên hiştin. Rojek tune ye ku agahiyeke li ser tundiyê nekeve ragihandinê. Ji ber ku li gorî nêrîna baviksalar di fitratê de wekheviya jin û mêr tune ye û dema ku jin denga xwe neke û li gorî rolên civakî tev bigere tundî jî nabe, kuştin jî nabe.

Li Rojavayê Kurdistan, Bakur û Rojhilatê Sûrî Tundiya Li Ser Jinê

Îro şoreşa Rojava bi rastî û bingeha xwe di tevahî cîhanê de weke şoreşa jin tê naskirin. Lê em nikarin bêjin ku rexmê ev şoreşa 11 salan, rexmê ewqas destkeftin û pêşketinên jin di nav civakê de ev feraset bi temamî xilas bûye. Îro li Rojava – Bakur û Rojhilatê Sûrî çanda malbatî, eşîrtî û olî ji bo berdewamiya tundiya li ser jinê hêmaneke girîng e. Dîsa rastiya dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê, siyaseta rejîma BAAS a xenikandina şoreşê ji bo berdewamiya tundiya li ser jinê hêmanên gelekî girîng in.

Mînak li gorî rapora ku Kongre Star li kampên koçberan amade kiriye di encama siyaseta embargoya aborî ya rejîma faşîst a mêtînger a BAAS zehmetiya herî mezin jin dijîn. Li gorî vê rapora ku li 5 kampan hatiye amadekirin pirsgêrêka herî mezin pirsgêrêkên mazot û bihabûnê ye. Di encama erdhejan de 3 hezar kes ji Efrînê koçberî Helebê dibin û li Şehbayê di kampan de dimînin. Piştî erdhejan de jî hikûmeta Şamê embargoya aborî bi dawî nake. Dîsa li gorî vê lêkolînê ji %80 kesên ku tevlî pirsnameyê dibin bêkar in ji di milê aborî de muhtacê hevjînên xwe ne. Ji %82 jinên ku tevlî pirsnameyê dibin ji ber rewşa aborî nikarin xwe derman bikin, ji %10.4 ji ber heman sedemê cara duduyan nikarin biçin doxtor ji %2.4 jî tenê careke karine biçin doxtor. Dîsa ji ber embargoya hikûmeta Şamê jineke hamil ji bo ku nikarîbû biçe Helebê jiyana xwe ji dest da. Dîsa intihar, kuştina bi sedema namûsê, exlaq, aded û teqelîdan bi kêmbûn berdewam in.

Li Efrînê Kiryarên Dewleta Tirk û Çeteyên wê û Rewşa Jinan

Di sala 2020'an de 92 jin hat revandin ji wan 9 jin hatin qetilkirin, di sala 2021'an de 82 jin hatin revandin û ji wan 14 hatin qetilkirin, di sala 2022'an de 49 jin hatin revandin û ji wan 13 jin hatin qetilkirin, di sala 2023'an de 7 jin hatin qetilkirin û aqûbeta piraniya wan nayê zanîn. Hîna di meha Gulana 2023'an de bi deh roj navber yek ji wan 12 salî yek ji wan 14 salî du zarok ji aliyê çeteyên Sûltan Mûrad Şah (Emşet) ve hatin tecawîzkirin û zarokeke 14 salî jî ji bo zorê bê zewicandin hat revandin.

Navendên ku Jin Lê Tên Girtin û Tecawîzkirin

Li gorî agahiyên ku ji çavkaniyên hundir tên girtin li Efrînê bi dehan navendên şkence, girtin û kuştinê hene. Ji van navendan hinek taybet ji bo jinan in. Navenda kevin a Meclîsa Teşrî ya Kevin niha ji aliyê çeteyan ve weke zindana jinan tê bikaranîn. Di vê zindanê de nêzikî 50 jin hene. Çeteyên girêdayî istixbarata girêdayî dewleta Tirk, jinên ku direvînin weke "emanet" bi nav dikin û rayeya kuştina 10 – 30 jin hatiye dayin her serçeteyekî. Cudayî vê zindana "El mehkeme" di bînayeta kevin a dadgehê de ye. Jinên ku ji bajarokên Efrînê hatine revandin di vê zindanê de tên girtin. Di zindanên din ên ku ji aliyê çeteyên El Hemze û El Feyleq ve tên bi rê ve birin jî beşên jinan ên taybet hene û niha bi dehan jin di van zindanan de ne û aqûbeta gelekî jinên ku hatine revandin nayê zanîn.

Îro wekî ku di van daneyên şênber de tê dîtin li ser jinê tundiya dewlet û mêr rastênhevê hev tê rêxistinkirin. Her du jî xizmetî feraset û pergala kapîtalîzmê dike. Ev rastî tenê bi têkoşîna jinê ya rêxistinkirî dikare bê têkbirin. Îro li Rojava hêza me ya herî mezin ew e ku destkeftinên şoreşa jinê yên weke zagon, hevpeyman, rêxistin û mafên jinê ji bo têkoşînkirina li hemberî vê yekê ji bo me derfeta herî mezin e. Divê em pişta xwe bidin hêz û şoreşa xwe.

DENGÊ ŞEHÎDÊN ME YÊN KU JI HER DERÊ TÊ

Rêhevalbûn û bi rêhevaltî jiyankirin her tim parçeyek ji jiyana me ye ku hestên manewî zindî digire ye. Ger ku em di çarçoweyeke berfireh de binêrin em her yek di qorziyekî cîhanê de hatin welidîn û mezinbûn. Rastiya ku me tîne cem hev jî weke komûnîst ji bo cîhaneke bê sînor û bê çîn biryardayina me ya jiyankirinê ye. Şehîdên me yên ku di meha Hezîranê de bûn nemir ên weke Elende El Mihemed, Halîl Aksakal, Sevda Çagdaş û 33 şehîdên me yên Pirsûsê yên ku di 20 Tîrmehê de di rêya Kobanê de şehîd ketin. Her rêhevalek di cih û şertên civakî yên gelekî cuda de welidîn û mezinbûn. Lê wan hemûyan weke şehîdên Partiya Komûnîst a Marksîst Lenînîst bi awayekî biryardar di oxira heman xeyalê de canê xwe fidakirin.

Temirê bi zarokên gelê Kurd, Suryan, Aşurî û Ereb ve biratî û yekîtiyê xurt dike. Şerê ku tê meşandin tenê ne li dijî hovitiya DAIŞ'ê ye. Di heman demê de li dijî dijminatiya ku bi sed salane di nav gelan de hatiye afirandin jî şer dike rêheval Mazlûm. Li her derê bi rêhevaltiya xwe ya xurt û wêrekiya xwe dibe mînak. Bê navber û bê rawestan heta dawiya dilopa xwîna xwe di tevahî cepheyên şer de cihê xwe digire.

Li Axên Ereb Komûnîsteke Tirk

Rêheval Sevda Çagdaş weke zaroka malbateke Sêwasî û Tirk ji dayik bû. Rêheval Sevda hîna di temenê xwe yê 22 salî de tevlî nav refên MLKP bû. Yek ji kirdeya têkoşîna azadiya jinê ya herî xurt bû. Rêheval Sevda dema ku êrîş li ser Kobanê hat lidarxistin li Bakurê Kurdistanê yek ji kirdeyên berxwedanê Erebo de bi rihekî fidayî şer kir bû nemir. Li axên ku gelên Ereb lê dijiya weke komûnîsteke Tirk bi rihekî fidayî şer kir bi bihayê canê xwe parastina gelê Ereb kir.

Komûnîsteke Kobanêyî Ku Bingeha Xwe Ji Komkujiya Pirsûsê Girt

Rêheval Elende El Mihemed li parçeyê Rojava yê Kurdistanê, li Kobanê ji dayik bû. Di wê demê de di dibistanên rejîma BAAS'de xwend. Di nav malbatê de û li derdora xwe fikrên komûnîst nas kir. Lê li derdora xwe gotin û pratîka kesên ku ew fikrên komûnîst vedigotin di jiyana wan de ne wekhev bû. Dema ku çeteyên DAIŞ'ê êrîşa Kobanê kir rêheval Elende û malbata xwe wekî bi hezaran gelê Kobanê ketin rêya koçberiyê û gîhaştin Rihayê. Bi salan li Rihayê jiya û ji nû ve fêrî ziman dabû. Bi biryardariyeke mezin ji Elende El Mihemed vegeriya Zîlan Destan. Berê xwe da çiyayên azad û ji bo ku li axên şoreşê yên Rojava xeyalên 33'ê şehîdên Pirsusê pêk bê bû xwedî kedeke mezin. Bi dehan ciwanên Rojavayî weke şopdarên şehîdên Pirsûsê rêxistin kir.

Ji Her Netew û Baweriyê 33'ê Komûnîst û Rêwiyên Xeyalan

Ji bo ku li dijî faşîzm û paşverûtiyê xurtkirina berxwedana Kobanê ya ku bandora wê li her dera cîhanê belav bû û bajarekî ku bi erdê re hatiye kirin yek ava bikin derketin rê. Di 20'ê Tîrmeha 2015'an de bi hovitiyeke mezin hatin qetilkirin. Armanca wan xurtkirina şoreşa Rojava, xurtkirina şoreşa jin û mezinkirina vîna gelan bû. Yek ji armanca wan a herî girîng di navbera şoreşa Rojava, Bakurê Kurdistan û Tirkiyê de avakirina cisirekî gelan bû. Di şeran de destpêkê de cisir tên firandin. Di wê demê de Pirsus di navbera Kobanê, Rojava, Bakur û Tirkiyê de cisirekî girîng bû. Û ew di germahiya sotîner a meha Tîrmehê de bi hemêzkirina bayê hênik a şoreşê derketin rê. Ew di rêya Pirsûsê û Kobanê de bûn rêwiyên xeyalan. Faşîzma AKP bi hevkariya DAIS û istixbarata xwe 33'ê rêwiyên xeyalan ku cisirê şoreşê bûn bi awayekî hov qetil kir. Ew zarokên ji netewên Kurd, Ereb, Çerkes, Laz, Hemşîn (Ermen) Tirk bûn, Elewî, Misilman, xwendekar, mamoste, bijîşk, endezyar, karker, kedkar, dayik û bav bûn. Û îro ew li ser axên şoreşê bi xeyalên xwe bawerî û hezkirina ji gelan rê nîşanî me didin.

Li Axên Kurd Komûnîstekî Ereb

Rêheval Halîl Aksakal li bajarê Antakyayê weke lawê malbateke Ereb û Elewî ji jiyanê re çavên xwe vedike. Rêheval Halîl di temenê xwe yê 18 salî de weke karkerek partiyê nas dike û biryara şoreşgertiyê dide. Di qadên leşgerî yên MLKP'ê de bi salan erk digire ser milên xwe û xwe weke kadroyekî profosyonel pêş dixe. Li çiyayên azad perwerdeyên leşgerî yên taybet distîne û li Rojava ew weke rêheval Mazlûm tê naskirin. Di cepheyên şer ên herî pêş de bi dehan şervanan fermande dike rêheval Mazlûm. Weke rêhevalekî Ereb û Elewî bi yek bi yek şkenandina sawîna ku rejîma BAAS di nav gelan de afirandibû li cepheyên Til bû. şefê faşîst Erdogan dema ku digot "Kobanê ket wê bikeve" di kolanên Amedê de li pêşiya girseyên ku şoreşa jinê diparastin bû. Di serhildana 6-8'ê Cotmehê de bi guleyên çeteyên ku têkçûn qebûl nedikir birîndar bû. Pêvajoyeke tedawiyeke dirêj derbas kir. Lê ji bo bûna kirdeya şoreşa Rojava ya jinê biryara xwe dabû û êdî ew Raperîn Dîcleya Rojava bû. Bi xîreteke mezin perwerdeyên xwe yên leşgerî û bîrdozî qedand. Xwedî xwestekeke mezin a hesappirsîna ji dijmin bû. Di hemleya Minbicê de bi xwestekeke mezin cih girt û ji bo ku di hemleya Minbicê de cih bigire bi xwe ferzkirina rêxistinê cih girt û di bin fermandeya şehîd Ferhad bû, li wir demekê xebitî lê mêjî û rihê wê li Kobanê ma. Dema ku komkujiya Pirsusê çêbû rêheval Elende li Rihayê bû û wê rojê ket nav lêpirsîneke mezin. Kê çima dixwast biçe Kobanê û ji bona çi ew hatin qetilkirin? Ez ji Kobanê me ez çima neçûm? Piştî wê bi demekê dîsa vegeriya Kobanê. Piştre şehadeta şervana MLKP'ê Destan Temûz li ser televîzyonan temaşe kir û weke jineke ciwan pir bandor bû. Careke din di mêjiya wê de brûskan lêxist. Rêheval Elende weke ku diqetîne û distîne li Kobanê ket lêgerîna şopa komûnîstan û herî dawî xwe gîhand wan. Roja ku ew naskirin jixwe rêheval Elende biryara bûyîna şervana MLKP û Rêxistina Jinên Komûnîst

Pergala kapîtalîzmê ya mêtîngeriyê îro belavî cepheyeke gelekî berfireh dibe. Çiqasî netew, mezheb û pêkhateyên civakê yên cuda hebin ji aliyê pergala kapîtalîzmê re te refkirin. Kapîtalîzm bi refkirina wan hewl dide ku serweriya xwe bi awayekî hîna xurtir ava bike. Lewma pêşengên gelên bindest her çiqasî ku di şertên cuda de bijîn jî weke bindest bi xwedî derketina nasnameya komûnîst dibin deng û rihê bi mîlyonan gelên bindest. Şehîdên me jî sembola vê rastiyê ne û weke bîrdoziyî û siyasî nirxên me yên manewî yên herî bi nirx in.

Em ê Rojava ji her derê xweştir bikin

Bavê Mazlûm
(Endamê Meclîsa Qamişlo)

Hêviya min heye. Em bang li gelê xwe dikin ku li Rojava bimînin. Em dixwazin ku herkes li Rojava bimîne û welatê xwe ava bikin. Em dibînin gelê me berê xwe dide bajar û welatên xelkê. Ew bajar bajarê xelkê ye, ne ya me ye em hêvî dikin ku kesên ku koçberî welatên cuda bûne dîsa vegerin. Kengî hûn hatin ax axa we ye, namusa we ye, cihê şehîdên me ne. Me bi hezaran şehîd ji bo rizgarkirina van axan da ye. Dewletan bi sîleh nikarîbûn me têk bibin. Ji bo wê dixwazin em axa xwe berdin û koçber bibin. Hewl didin ku kesên xerîb û malbatên çeteyan bînin di dewsa me de bi cih bikin û li cihên me bijîn. Dixwazin çanda me tune bikin û axên me bixin destê xwe mîrasê şehîdên me tune bikin.

Wê rojek bê ji bo me û gelên bindest ev ê bibe kêmasiyeke mezin. Em diçin welatên Ewropa û dibin bindestê bindestan. Ka ev tişt çawa çê dibe û em çawa qebûl dikin? Em bang li ciwanên xwe û li gelên xwe dikin ku xwe bispêrên axa xwe. Axa xerîban ji me re nabe, em çima herin û bibin koleyên wan? Bi hezaran şehîd îro di vê axê de ne û sûretên wan li her derê daliqandin e. Erê kêmasî hene, kar kêm e lê ev nayê wateya we ku em axa xwe vala bikin.

Divê em bi awayekî hîna xurtir ava bikin. Axa me zêr û zîv e. Wê rojek were em ê zora Ewropa û ya cîhanê giştî bibin. Derfeteke zêrîn li cem me ye, lê divê ku em ked bidin û biwestin. Heger em newestin em sûda wê nabînin. Rojava li hêviya we ye, Rojava bang li we dike. Çanda Ewropa ne çanda me ye, li wir azadiya gelan tune ye. Em li vir azad in. Werin bi biratî û xweşbûn destê xwe bidin hev Rojava xurt bikin. Em ji wê zilmê xilas bibin. Hêviya min heye em ê Rojava hîna xweştir bikin.

Cure û Sedemên Koçberiyê

Ehmed Xidir
(Endamê Meclîsa TKŞ ê Hesekê)

Di serî de em behsa koçberiyê û çawaniya wê li herêma me bikin. Koçberî bi armanca peydakirina derfetên jiyanê ji ya berê çêtir ji cihekî derbasî cihekî din bûyîn e. Beriya Şoreşa Rojava, ji ber sedemên siyasî û jiyanî tenê koçberî li derveyî welat dihat sînordarkirin. Bi taybetî ev yek li Bakur û Rojhilatê Sûrî ûsa bû. Ji gundan ber bi bajêr û ji wir jî ber bi cihên din ve ji bo karkirinê gelek koçber dibûn.

Koçberî bi vekirina sînorên dewleta Tirk a faşîst ji hemû pêkhateyên Ereb, Kurd, Suryan, Ermen, Çerkes û hwd. gelekî zêde bû. Armanca vê yekê valakirina herêmê ji gelê xwe û bi taybetî jî ji ciwanan bû. Ji ber ku dijmin baş dizanin ku ev şoreş li ser milê ciwan û proleterên karker, gundî û kedkaran pêk tê. Li vir me ronî da ser koçberiya bi darê zorê (mecburî) ya bi rêya dagirkerî, şer yên taybet, mîna ya ku li Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê qewimî. Piştî ku dewleta faşîst û çeteyên ev bajar dagirkirin, gelê ku li van bajaran dijiyan cihên xwe terikandin. Jin û zarok hatin qetilkirin û li van deveran dest bi avakirina wargeh ji bo malbatên çeteyên xwe û penaberan kirin.

Armanca vê avakirinê guhertina demografiya herêmê bû. Ev hemû jî pêkanîna hovane ya dewleta Tirk a faşîst û çeteyên wê nîşan dide. Û em behsa cureyên koçberiyê dikin. Koçberiya navxweyî Ji gund heta bajar û sedemên wê kar an xwendin in. Koçberiya bi darê zorê gelek sedemên wê hene. Ya herî girîng jî dagirkirina welatekî ji aliyê welatekî din ve ye. Em dikarin ji bo vê mînaka dagirkeriya dewleta Tirk a li herêmên me bidin. Koçberiya biyanî ya laîkbûn ji ber zagon û rêzikên tund ên rejîma berê ya desthilatdar pêk tê. Dîsa koçberiya pîşesaziyê yek ji mînakên vê yekê ne. Divê em weke Tevgera Komunîst a şoreşger gelê xwe li ser xeterî û armancên vê koçberiyê perwerde bikin ku li dijî her cure êrîş û zehmetiyan dev ji axên xwe bernedin.

Ji ber bêdengiya navneteweyî ya li hemberî bûyerên ku li herêmên me yên Rojava di warê kuştin, revandin û destavêtinê de diqewimîn bi sedan koçberên Sûriyeyê xeniqîn, dewlemendiyên van herêman ji aliyê dewletên kapîtalîst ên bi pêşengiya dewleta Tirk a faşîst ve hatin talankirin. Pêwîst e ku em xwedî li welat, ax û dewlemendiyên xwe derkevin.

Şoreşa Rojava Deriyê Jiyana Azad e

Bihar Mistefa

Biryara me ne koçberî ye lê em koçber dibin. yan em dil li dû xwe dihêlin û ber bi zorê ve diçin. Mîna şerê Kobanê neçartî û tirsa xwe li kolanên Kobanê pêçayîbû her kes neçar bû ku çi bike û ji welat derketin welatên cuda. Rêbazên siyaseta dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê û hevkarên wê pir qirêj in. Dema êrîşa welatekî an jî bajarekî dikin destpêkê de tirsê didin Ava kirin û destdirêjî li jinên wan dikin, zarokan didin revandin û gel dikujin . Ji bo ku siyaseta xwe ya qirêj bidin meşandin û gel bê hêz û neçar bimîne û koçber bibe û ji hev bikeve van kiryaran li ser gel pêk tînin. Ji ber ku dewleta Tirk a dagirker û hevkarên wê baş dizanin ku dema gelên bindest yek bibin tu hêz nikare êrîşa axên wan bikin.

Ji ber wê bi her awayî siyaseta qirêj didin meşandin ku me Kurdan parçe bikin. Mînak şerê Kobanê, mînak çi li Şengalê kirin me dît. Ji ber tirsa Şengalê ji gelê Kobanê bigire heta Serê Kaniyê û Girê Spî û Efrînê gel koçber bûn û heya anha her Tiştî dikin ku gel ji welat derxin. Dema koçberiya şerê Kobanê bû bi zanebûn bi siyaseta qirêj a dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê û dewletên navnetewî her tişt dane meşandin, komên çeteyên xwe ava kirin û berdan nava me. Piştre dewleta Tirk deriyê xwe ji me re vekir. Daxwaza wan bi rêya valakirin dagirkirina Kobanê bû. Yanê em dizanin ev vekirina derî ne ji bo reşka çavên me bû û dewletên navnetewî wek Emerîka , Rûsya HWD. hatin û di bin navê alîkariya şer de berjewendiyên xwe dan meşandin. Û hîna jî dixwazin ku ciwanên me ji welat koçber bikin bi hemû rêbazên şer êrîşe me bikin. Ev di heman demê de rêbazên şerê taybet, şerê psîkolojîk û aborî ye. Her tim tirsê di nava gel de ava dikin. Şerê aborî didin meşandin. Ji xwe aborî sedema herî hesas ku Ciwanên me pê koçber dibin e. Di nav me de sixûrên xwe rêxistin dikin. Bi rêya hişbir û hwd. dixwazin ciwanan ji şoreşê dûr bixin.

Lê êdî em gîhaştin zanebûnekê. Me çawa ku li Kobanê, Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî li ber xwe da û ala berxwedanê rakir em ê ev koçberiya ku bi siyaseteke kûr tê meşandin teqez bidin sekinandin. Çaresariya wê jî perwerde ye. Pêwîst e ku em weke Komûnîstên Rojavayî her tim di nava gel de nîqaş bikin û ev şerê qirêj bidin naskirin. Pêwîst e em baş bidin naskirin ku dijmin dixwaze gelên me ji welatên xwe koçberî derveyî welat bibin. Pêwîst e em baş bidin naskirin ku dema em koçberiyê qebûl dikin em jî wekî gelê Filîstîn dibin, mal û milkên xwe difiroşin û koçber dibin. Em bînin bîra xwe gelê Filîstîn çawa mal û milkên xwe firotin û koçberbûn û welatê wan ji aliyê siyonîzma Îsraîlê ve hat dagirkirin. Ger ku em jî îro dikevin rêya koçberiye wê qedera me wekî gelê Filîstîn bibe. Lê hîna beşek ji gelê Filîstîn li hember dagirkeriyê li ber xwe didin. Pêwîst e em baş fêm bikin ku koçberî ne qedera me ye, qedera me di destê me de ye. Û em ê bi destê xwe qedera xwe bi têkoşîn, yekîtî û berxwedana xwe binivîsin. Em ê bi berxwedana xwe welatê xwe hemêz bikin. Şoreşa me deriyê nivîsandina qedera xwe û guhertina vê rewşê ye.

Li Dijî Mêtîngerî û Dagirkeriyê Bijî Şoreşa Rojava

HESEKÊ - Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ) berî 1'ê Gulanê ya roja piştgirî, têkoşîn û Yekîtiyê ya çîna karkeran bi dirûşmeya "Li Dijî Mêtîngeriya Kapîtalîst û Dagirkeriyê Bijî Şoreşa Rojava, Bijî 1'ê Gulanê" sempozyûmek li dar xist. Ji bajarên Rojava bi sedan kes beşdarî sempozyûmê bû û bi taybet tevlîbûna jinan a girseyî bal kişand.

Di sempozyûma ku li sala Marbela hat lidarxistin de di bin serenavên "1'ê Gulanê, çîna karkeran û di şoreşa Rojava de destkeftinên kedkaran çi ne?" û "Divê em ji bo pêşxistin û parastina destkeftinên xwe çi bikin?" de du rûniştandin hat rêxistinkirin û li ser van esasan nîqaş hatin meşandin.

Pêkhateyên Yekîtiya Suryan, Meclîsa Gel a Zirgan, Mala Silhê, Kongre Star, Partiya Guhertin a Demokratîk, Saziya zanyarên jin ên olî, MSD, Hêza Parastina Xabûr, Meclîsa Civaka Aşûrî, FOC'a Elîşêr Denîz, Yekîtiya Rewşenbîran û Komîteya kedkaran jî beşdarî sempozyûmê bûn. Sempozyûm di şexsê Serokê Partiya Komûnîst a Filîpîn Kaa Laan û sekreterê wê ya giştî Ka Bagong Tao de ji bo şehîdên şoreşê bi deqek rêzgirtin hat destpêkirin. Ji nûnerên TKŞ Fadya Sîdo axaftina desppê kir û di axaftina xwe de di cîhanê de girîngiya têkoşîna çînî anî ser ziman û bal kişand ser rola yekîtiya çîna karkeran a di milê têkoşîna çînî de û dîsa bal kişand ser rola têkoşîna karkeran di milê hilweşîna kapîtalîzmê de. Piştî axaftinê li ser dîroka 1'ê Gulanê sînevîzyonek hat pêşkeşkirin.

"Karker û Kedkar Şoreşê Li Ser Piyan Digirin"

Di rûniştina 1'emîn a sempozyûmê de berdevka CKŞ Destan Serhed, ji rêvebirên Komîteya Kedkaran Esed Elî û ji nûnerên TKŞ Abdulhalîm Osman axivî.

Destan Serhed di axaftina xwe de anî ser ziman ku teva derketina milkê xas nakokiya cinsî jî çêbûye û karker û kedkaran li dijî kapîtalîzmê têkoşînên mezin meşandin e. Destan Serhed anî ser ziman ku hêzên kapîtalîst dixwazin ku şoreşê hilweşînin. Destan Serhed di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser kêmasiyên mafa karker û kedkaran ên di nav şoreşê de û diyar kir ku rêya yekane sosyalîzm e.

Rêvebirê Komîteya Kedkaran Esed Elî derheqê xebatên komîteya kedkakaran de nirxandin kir û diyar kir ku di mijara mafên karkeran de xebatên ronîkirinê dikin. Elî da xuyakirin ku di heyema rejîmê de parastina mafa karkeran nedihatkirin. Elî da xuyakirin ku Rêvebiriya Xweser bi karker û kedkaran ve xebatên hevbeş dide meşandin.

Ji nûnerên TKŞ Abdûlhalîm Osman di axaftina xwe de got "Karker û kedkaran di vê şoreşê de cih girt. Bi rêya komîn û meclîsan tevahî destkeftinên şoreşê bi hewldana çîna karkeran çêbû."

Em Bi Federasyona Rojhilata Navîn Dikarin Şoreşê Pêş Bixin

Di rûniştina duyemîn ya bi navê "Divê em ji bo parastin û pêşxistina şoreşê çi bikin" de weke axivker ji nûnerên Saziya Yekîtî û Piştgiriya Gelan (SYPG) Bêrîtan Asya, endamê Yekîtiya Rewşenbîran Mihemed Beşîr û ji nûnerên TKŞ Cemîl Sîdo beşdarbûna.

Bêrîtan Asya li ser kûrewîbûna emperyaliyetê de axivî û diyar kir ku bingeha kapîtalîzmê li ser keda karken tê avakirin. Asya di berdewamiya axaftina xwe de da xuyakirin ku pergala kapîtalîst di nav qeyraneke hebûnî de ye. Asya axaftina xwe wiha qedand "em şoreşa xwe dikarin bi rêya şoreşên herêmî û federasyona demokratîk û sosyalîst a Rojhilata Navîn bi pêş bixin".

Nûnerê Yekîtiya Rewşenbîran Mihemed Beşîr li ser pêvajoya sedemên serhildana gelê Ereb axivî û got "dewletên ku Kurdistan kirin mêtîngeh û emperyalîst ji mezinbûna agirê şoreşê ditirsin.

Ji nûnerên TKŞ Cemîl Sîdo di axaftina xwe de got "Şoreşa Rojava ji bo çaresariya pirsgêrêkên Rojhilata Navîn mifteyeke, şoreşê îro yekîtiya gelên herêmê derxist pêş û ev şoreş bi hêza yekîtiyê tê parastin"

Cemîl Sîdo di berdewamiya axaftina xwe de li ser bendên bernameya TKŞ axivî û diyar kir ku ji bo parastina şoreşê sosyalîzm pêwîst e.

Divê rûniştinê de endama CKŞ Ekîn Îsyan mafa axaftinê girt û bal kişand ser pirsgirêkên ciwanan û bangewazî kir ku ciwan bi awayekî hîna xurtir xwedî li şoreşê derkevin. Xanim Îbrahîm a ku ji Kobanê tevlî sempozyûmê bû bal kişand ser destkeftinên jinan. Ji welatên wekî Filîpîn, Polonya û Elmanya rêxistinên şoreşger mesaj şandin sempozyûmê.

Xalên Ku Di Sempozyûmê De Derketin Pêş

Me weke TKŞ berî 1'ê Gulanê di dîroka 27'ê Nîsana 2023'an de sempozyûmek li dar xist. Sempozyûm bi serkeftî bi dawî bû.

Di sempozyûmê de bi tevlîbûna gelên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan û Êzîdî li ser mijarên kapîtalîzma emperyalîst û êrîşên dagirkeriyê hat nîqaşkirin. Pirsgirêkên yekîtiya karkeran hatin nîqaşkirin. Di heman demê de berî sempozyûmê li ser şert û mercên kar û daxwazên karkeran di nav karker û kedkaran de pirsnameyek hat çêkirin. Hem ji nîqaşên sempozyûmê û hem jî ji encamên pirsnameyan daxwazên karkeran ên li jêr hatine gotin derketin pêş. Em van encaman bi gelê xwe re parve dikin. Em dixwazin diyar bikin ku ji bo bicihanîna van daxwazan em ê erka xwe bi cih bînin.

1'ê Gulanê ya ku rejîma BAAS'ê veguherand merasîmeke dewletê, Divê dîsa weke roja têkoşînê, ala têkoşîna li dijî emperyalîzm, dagirkerî û her wiha li dijî kapîtalîzmê mil bi mil bi kedkar û kedkarên herêmê û cîhanê re bê bilind bikin.

Divê çêkirina rêkarên yasayî ji bo qedexekirina karkirina karkeran ji 8 demjimêran zêdetir, û Yekîtiya Kedkeran ji pêkanîn û çavdêriya vê yekê berpirsiyar bibe.

* Sazkirin û misogerkirina ji bo karkerên jin, mêr "Ji bo karê wekhev mûçeya wekhev"

* Pêkanîna zagona Rêveberiya Xweser a qedexebûna xebitandina zarokên ji 18 salî biçûktir, sînordarkirina bi çar saeta xebata zarokên ji 18 salî biçûktir û rakirina çiraxtî.

* Divê ji bo hemû xebatkaran misogeriya kar bê dayin, derxistina ji kar zehmet bibe. Divê li ser vê yekê rêgezên zagonî bên çêkirin. Avakirina sîstemeke sîgorteya giştî ya ku hemû karkeran hembêz bike.

* Divê hemû karker û kedkar ji xizmetên tenduristiyê yên bêpere sûd werbigirin.

* Divê Sendîkaya Kedkaran ne tenê ji bo daxwazên xwe yên aborî û rêxistinkirina karker û kedkaran têbikoşe. Divê ev têkoşîn bê kirin bingeha şoreşê.

* Divê zagona şert û mercên kar û mafên karker û kedkaran bê derxistin.

Piştî Guhertinên Serhildanên Gelê Ereb Rewşa Gel

Vîna gel li dijî dîkdatoran bi ser ket an jî na? Ji 12 sal bêtir me serhildanên gelê Ereb dît an jî me jiyan kir. Di Rojhilata Navîn de piştî serhildanên gelên Ereb ku weke bihara Ereban tê naskirin dewletên kapîtalîst û emperyalîst ên cîhanê ku dûrî nirx û exlaqê ne hiştin ku gelê Ereb di cehenemê de bijî. Gelên ku ji bo edalet û wekheviyê rabûn ser piyan dîkdatoriyên demdirêj hilweşandin. Lê bi destdanîna ser şoreşan a dewletên emperyalî axên Rojhilata Navîn bi xwîna zarokên gelan hat avdan. Gelek dewlet bûn sedemên avakirina nîjadperestiyê, gelek dewletan destê xwe di komkujiyan de heye. Siyaseta Rojhilata Navîn teva Emerîka ji aliyê çend dewletên ku di milê teknolojî û zanîstî de pêş ketine tê rêvebirin. Di navbera dewletên emperyalî de di Rojhilata Navîn de aboriya Sîn û Rûsyayê jî xurt bûye. Lê qasî wê pirsgêrêkan jî dijîn.

Bingeha Danûstandinên Bazirganî

Nedîtina çaresarî ji pirsgirêkên hewayî û ekolojîk re, hilberana zêde û nepeydakirina bazara danûstandinê, li ser çavkaniyên enerjiyê nebûna kontrolê, li çend welatan pêşketinên pêşsaziyên herêmî pirsgêrêkên bingehîn in. Pêwîst dibe ku ji vê qeyranê bê derketin. Zemîna herêma Rojhilata Navîn ji bo wê guncaw bû. Qezenckirina dewletên kapîtalîst ji van şerên ku ji alî dewletên Erebî ve derketine hîna mezintir bû. Di bin siya têkoşîna xwe ya aborî de siyaseta xwe diafirîne. Di bin navê azadî û demoqratî de teşwîqkirinan ava dike. Agirekî dijminatiyê di navbera gelan de ava dike. Vê hişt ku parçebûn di navbera dewletên Erebî de çêbibe. Hinek ji wan bi Îsraîl re hevkarî kirin ku desthiladariya xwe li ser gel berdewam bikin. Nakokiyên navbera Ereb – Îsraîl û doza Filîstinê ji bîr kirin. Ji bo xêzkirina siyaseteke nû ya cîhanî û bi taybetî şerê Rûsya û Ûkrayna, di qada navnetewî de vekişîna hevpeymana navneteweyî ya Emerîka ji Efxanîstanê. Hevbendiyên herêmî yên ku li Rojhilata Navîn derketine holê bû sedema valahiyekê. Vê yekê hişt ku dewleta Sînê li Rojhilata Navîn û Efrîqayê di warê aborî de bi awayekî serbest tev bigere.

Rola Dewleta Sînê di Herêmê de

Dewletên kapîtalîst pevçûnan ava dike. Ji bo vê yekê hesabên di navbera dewletên Ereb de destpê kir. Ku rola wan di xêzkirina siyasetên nû li cîhanê yên wekî Erebîstan, Siûdî, Misir ku hilma xwe bi hev re dikişandin. Tirkiyê û Îran liser serweriya welatên Erebî û îslamî yên cîhanê roleke mezin di derketina şerên navxweyî di çend welatên Erebî de lîstin. Ji heta ku beşek ji wan ji aliyê leşgerî ve dagirkirin û bi vî awayî aboriya wan ji bo berdewamiya dagirkeriya wan kêm bû. Welatên Ereb ji serhildanên gelê Ereb tecrûbe derxistin û ji aliyê kapîtalîzma cîhanî ve ji bo derbaskirina qeyranên xwe yên aborî di bin siya kapîtalîzmê de hatiye dîtin xwe hîna xurtir ava kirin. Baş fêmkirina dîplomasiya Ereban ji bo yekbûyîna Ereban û sazkirina mala Ereban. Sînê di vî warî de dest bi hewldan û hevkariyan kir. Roleke mezin lihevkirina welatan û Îranê de lîst û têkîliyên aborî yên du alî avakirin. Û piştgiriyên ku pêwîst dibe ji bo danîna projeyên aborî derxist pêş ku di welatên cîhanê de rola xwe ya aramiyê îspat bike.

Karên Ku li pêş Yekîtiya Erebî

